


*Dr. Sozdar Mîdî (E. Xelîl)*

*wergera ji erebî: Mustefa Reşîd*

**Xeleka Gotaran: Kurd û Îslama Siyasî**
**Xelek 4**

# Rah û Damarên Ramanên Ayînî li Kurdistanê

Berî Cihûtî, Krîstiyanî û Îslametiyê neteweya Kurd bi ti awayî ne di tarîtiyeka giyanî û sincî da dijiya; wek ku hin îslamewiyên tuntrew hewldidin rewşa me wisa bidin xuyakirin. Bi vajayî wê, seranserê ax û zemîna Kurdistanê landik û dergûşa kevintirîn û navdartirîn sazûmanên mîtologî û ayînî li Rojhilata Navîn bû. Daku em vê rastiyê bidin xuyakirin, ka em hinekê li rah û damarên ramanên ayînî li Kurdistanê bikolin.

## Bergeh û Heyamên Pêşketina Mîtologiya Kurdistanî:

Hemû ol û ayîn - bi destpêkên xwe yên mîtologî va - wek diyardeyên giyanî yên çand û şaristaniya neteweyan tên hejmartin; ew wek şêwe û awayekî derbirîna dîtina wan neteweyan ya hebûnî û gerdûnî ye. Ji hêla din va ev diyarde û ev dîtin wek ayîne û neynika rewşa wan a civakî, siyasî û aborî ye jî. Daku em bi temamî rah û damarên Mîtologîya Kurdistanî têbigihînin, divêt em vegerin serdema kevin ya Neolîtîk (*neolithic*), ku 9000 sal b.z. destpêdike. Divêt em vegerin ser rewşa erdnîgariya wê demê ya germiyan û kuntarên çiyayên Zagros û Toros û derdorên wan (landik û dergûşa neteweya Kurd). Ji wan herêm û wan derdoran koça şaristaniyê bi mîtologiyê destpêkir û bi rê ket, û wisa ew di çar heyamên dîrokî ra derbas bû:

1- Heyama Şaristaniya Guzana: Şaristaniya Guzana di heyama kevirî û madenî da (5600 - 4400 b.z.) xuyabû. Ev şaristanî li gor

Girê Guzana, ku li nêziya bajarê Kurdan Serê Kaniyê ye hatiye binavkirin. Navê vî girî bi encama siyaseta nijadperest hate erebkirin û bû "Til Helef". Ev şaristaniya Guzana şaristaniyeka gelek petî û hîmî ye, ku wê li piraniya erdnîgariya Kurdistanê şopên xwe hîştine. Di hembêza vê şaristaniyê da hunera çandiniyê, hunera çandin û pirkirina giya, sewse û fêkiyan, xwedîkirina lawir û heywanan, avakirina avahî û xaniyan û çêkirina qermît û bikaranîna wî di gelek warên jiyanê da pêkhat û geş bû. Ji hêla din va dîsa ev şaristanî bû ku di hundirê wê da mîtologiyê destpêkir û berî her tiştî xwedawendên heyam û suriştê, xwedawendên dayîkî, bereket û berhemê, awa û şêwazên veşartin û binerdkirina miriyan, baweriya bi hebûna jiyaneka din piştî vê jiyanê û hwd. peydabûn. Hên di wan deman da gava mirovan miriyên xwe vedişartin seriyê wan bi aliyê rojava va dadinîn û rûyê wan didan aliyê derketina roj û tavê. Her wisa bi miriyan ra hin nawelên wan yên taybet dixistin gorê, bi baweriya ku dibe ji wan ra di jiyana din da pêwîst bibe[(1)].

2- Heyama Somerî: Ji erdnîgariya şaristaniya Guzana, Somerî ber bi başûrê Mezopotamiya va li dora salên 4000 b.z. daketin û bi xwe ra çand û şaristaniya Çiyayên Zagros (*Çiyayên Kurdistanê*) bi hemû naverokên wê yên ayînî, civakî, siyasî û aborî va anîn warên xwe yên nû. Wan li van warên nû êdî nivîsîn bikaranîn. Ji berma û nivîsên yên li ser qermît gelek berhem mane, wek nimûne Destana Gilgamêş. Li van herêman, Someran xanî û perestgehên xwe yên heya sê qatan jî li cihên bilind avakirine (*Avahiyên Sêqore*). Dîsa li vir salnameya li gor rojê bikaranîne û *Pantheona Xwedawendan* (*Civata Xwedawendan*) bi serpereştiya xwedawendê mezin *Anû* û di pey ra *Enlîl* û *Engî* bi nav kirine ku ev xwedawend siya xwe li mirovan dikin û jiyana wan bi rê va dibin. Ji şaristaniya Somer wek dûnda û neviya şaristaniya Guzana pêkhatên şaristaniyê derbûn û li gel mîtologiya li seranserê Rojavayê Asiyayê belav bû.

Di heyamên piştî wê ra, her gel û neteweyekê li gor çanda xwe êdî têda hin guhartin pêkanîn. Yek ji efsane û çîrokên mîtologiya wê demê çîroka Tofana pêximber Nûhe. Hemû bermayên çanda Somerî, Babilî, Cihûyî, Krîstiyanî û Îslamî dibêjin ku ew çiyayê

keştiya Nûh li ser daketiye li Kurdistanê ye. Navê wî çiyayî di bermayên Somerî û Babilî da *NÎSÎR*e. Li gor hin lêkolîneran ev çiya "*Çiyayê Pîre-Megron*"e ku li nêziya bajarê Silêmaniyê li başûrê Kurdistanê ye(2). Li gor pirtûka Tewratê ya Cihûhayn ev çiya "*Çiyayê Agirî*" ye (*Ararat*). Lê di pirtûka Qur'anê da tê gotin ku "*Çiyayê Cûdî*" ye. Akkadî û Babiliyan navê xwedawendê Somerî "*Ûtû*" (bi kurdî "*Etûn, Pêtî*) yanê Roj birine û nav lêkirine "*Şimş*". Xwedawendê Heyam û Suriştê yê Samiyan li Mezopotamiya û Sûriyayê (Heded, Ĥeded) ji guhartina navê xwedawendê Somerî "Addaw, Adad" (xwedawendê ku rizq dide) hatiye(3).

**3- Heyama Kaşî û Horiyan:** Ev heyam ji salên 2000 heya 1000 b.z. dirêj dibe. Di wan deman da erdnîgariya Kurdistanê di bin serdariya pêşengên Kurdan ji herdu şopên *Kaşî* û *Horî* (*Ĥûrî* = *Xorî*) da bû, tevî hukumdariya *Kaşiyan* li Somer û Babil (navenda Îraqa îro). Mîtologiya kurdistanî di wê demê da ber bi pêş ket. Li ba Kaşiyan xwedawend "*Xod, Xwe Da*" (yê ku xwe bi xwe daye) tê naskirin. Û xwedawendê rojê "*Suriaş*" li ba Horiyan "*Ê Sore*" tê gotin û di pey ra li ba pêşiyên Kurdan wek "*Ahora*" bi nav dikin(4).

Gelek şop û nîşanên wê yekê hene ku çanda gelên kevin yên Îraqa niha (*Akkadî, Babilî, Aşûrî, Kildanî*) û yên herêma Sûriya û Felestînê (*Fînîqî, Ken'anî, Ibranî, Aramî*) bandora xwe ji çanda Somer û şaristaniya *Kaşî-Horî* girtine, bi taybetî jî di warê mîtologiyê da. Tenê wek nimûne em xwedawendê Heyam û Suriştê "*Heded*" bi nav dikin ku ji xwedawendê *Suriştê* yê Horî "*Teşşûp*" hatiye, ewê ku hên di bermayên kurdên me yên Êzîdî da bi awayê "*Adû, Adî*" tê naskirin(5).

**4- Heyama Madan(Mîdiya):** Ev heyam ji salên 1100 heya 550 b.z. dirêj dike. Di vê heyamê da hemû şop û beşên pêşiyên Kurdan di warên çandî, civakî û siyasî da ketin nav hev û bûn yek. Padîşahê Madan yê yekemîn *Deyako*, kurê wî *Ferawurt* û neviyê wî *Keyxesro* pêşiyên Kurdan di warên siyasî, çandî û ayînî da heya bi radeyeka mezin kirin yek, û wisa bingehên pêkanîna neteweya Kurd avakirin. Di dema wan da neteweya Kurd taybetmendiyên xwe yên ji neteweyên din cuda û di nava xwe da

hevgirtî standin. Di wan deman da têgîhîn û nîşanên mîtologiya kurdistanî di nava tevaya gel da belav bûn û rûniştin. Di destpêkê da bêhtir li dor ayîna perestina *Rojê* digeriya û di pey ra bi awayê ayîna *Zardeştî* ya yekbûn *Xweda* cih girt.

## Ji Mîtologiya ber bi Yekbûna Xweda:

Ramana ayînî kurdistanî di pêşketina xwe da ji sazûmana mîtologiya destpêkî heya bi *Sazûmana Ayînî Yekbûyî* di çar heyaman ra derbas bû, û bi van xweseriyan tê naskirin ku ew jî evin:

**A- Mîthrayî:** Li gor xwedawendê rojê yê Ariyên Kevin "*Mithra*", xwedawendê *Hevgirtin û Hevpeymanê*, parêzvanê maf û rêzê, peywanê rastî û wergirê giyanê mirovan piştî mirinê. Xwedawend "*Mithra*" nîşana tav û rojê bû. Ev ayîn ber bi rojhilat va heya bi welatê Hind belav bû û ber bi rojavayê va Rojavayê Asiyayê derbas kir û di salên 60 z. da êdî ket Romayê. Di sedsala 2 ya z. da li seranserê Emperatoriya Romanî belv bû heya ku gihîşt giravên Brîtaniyayê jî[(6)].

**B- Zorvanî:** Li gor xwedawend "*Zorvan*", xwedayê xêr û ronahiyê û xwedayê demê. Di vir da *Ahora-Mezda* (xwedawendê Ronahî û Xêrê) û dijberê wî *Ehrîman* (xwedawendê tarîtî û şer) digihînin hev, herdu dibin yek têgihîn û yek xwedawend ku cudahî di navbera wan da namîne û wisa ji du-xwedawendîtiyê derbas dibe[(7)].

**C- Mezdayî:** Xwedayê cîhanê û hemû mirovan. Di vê ayînê da pêwendiyên navbera mirovan û hezên asîmanî gelek aşkera û zelalin. Em wisa bawer dikin ku peydabûna "*Mezdayiyê*" hevaltiya peydabûna ramana siyasî ya yekbûyî li ba pêşiyên Kurdan dike. Bi temamî di wê demê da gava baweriya siyasî-kurdistanî ku kesê Kurd xwe tenê wek endamê êl û eşîrekê didît, êdî vê rewşê derbas dike û xwe wek endamê yekîtiya êl û eşîrên seranserê welat dibîne.

**D- Zerdeştî**: Padîşahê Madan yê yekem *Diyako* hîmê Padîşahiya Madî li ser bingehên pêşketina ramana siyasî ya yekîtiya êl û hozên Kurdan danî û emperatoriyeka wisa avakir ku karibe welatê Mad û gelên çiyayî ji zor û setema emperatoriya Aşûrî rizgar bike (wisa xuyaye ku Kurd nabin yek heyanî zordarî li ser wan pir giran dibe). Li gel vê pêşketina siyasî, sazûmana ayînî ariyanî li ser destê pêximberê Madî *Zerdeşt* bû sazûmaneka yekbûyî bi serpereştiya xwedawendê yekane *MEZDA* û wek "*AHORA MEZDA = HORMEZD*" hat binavkirin; pêximber *Zerdeşt* hemû rewiştên pîroz lêkirin. Zerdeşt sazûmaneka ayînî, temam û tevayî danî ku têda rewayî, perestin, rê û şêwazên perestina Xweda, rêberiya Xweda li ser zemînê û çarenûsa mirovan li cîhana duwem gişt hene[(8)].

## Bandora Ramana Ayînî Kurdistanî li ser Herêmên din:

Di rastiyê da ramana ayînî kurdistanî, çi bi şêwazê Somerî û çi bi şêwazê rojperestî ku ji heyama Kaşî destpêdike heya bi Zerdeştiyê, şopên xwe yên pir girîng di ayînên Rojhilata Navîn da bi cih kirine; bi taybetî jî ew ayînên ku ji wan ra "*asîmanî*" dibêjin, wek *Cihûtî, Krîstiyanî* û *Îslametiyê*. Helbete emê nikaribin di vê nivîsê da bi berfirehî têkevin nava vê mijarê, ji ber ku ew hewceyî lêkolînên pir fireh û kûre. Em hêvîdarin ku emê ji pey ra van agahdariyên pêwîst temam bikin. Li vir emê tenê hin nimûneyan bidin:

**1- Çîroka Tofana Nûh:** Gava padîşahê Kildanî *Neboxez Nesser* bajarê *Ûrşelîm (Quds)* paytextê Cihûyan li Felestînê roxand, Cihû aware bûn û di sala 598 b.z. şarederî Mêzopotamiya û başûrê Kurdistanê kirin. Wan li wir çîroka pêkhatina gerdûnê, afirandina jiyanê û çîroka Tofanê wergirt. Di pey ra têda hin guhartin li gor sazûmana xwe ya ayînî Cihûyî pêkanîn. Ji Tewratê jî ev bermaya Somerî derbas nav Krîstiyanî û Îslametiyê bû.

**2- Beranê Qurbanê:** Rahên vê xweriska (adeta) ayînî hên li ba Horiyan hebûn. Wê hîngê Rêberê Ayînî sê tilûr (teyr) dianîn, hemû guneh û sûcên gel davêt ser wan û ew dikirin qurban ku

wisa seranserê gel ji sûc û gunehan rizgar bibe. Di pey ra ev xwerisk (adet) derbasî Cihûtiyê bû. Li ba wan Rêberê Ayînî yan nêriyek yan jî gayek dianî, gunehên gel diavêtin ser wî û ew berdida biyabanê. Vê xweriska han di pey ra bi awayê "Beranê Qurbanê" li ba pêximber Ibrahîm hat xuyakirin (wek ku di Tewratê da hatiye) û ji Cihûtiyê êdî derbasî Îslametiyê bû[9].

**3- Iblîs / Şeytan:** Berî ku Cihû li başûrê Kurdistanê bi cih bibin, gava *Neboxez Nesser* ew şarederî wir kirin, di bermaya wan da heyberekî wisa şerrûd bi navê (*Îblîs/Şeytan*) ku dijberiya Xweda dike, tinebû. Ev têgih ji Xwedawendê Şer *Ehrîman* ji Zerdeştîtiyê wergirtin, û bi hin guhartinan derbasî Cihûtî, Krîstiyanî û Îslametiyê bû.

**4- Cîhana Din:** Berî ku Cihû şarederî başûrê Kurdstanê bibin, di bermaya wan a ayînî da tiştekî wisa bi maneya "**Cîhana Din**", ku niha di Cihûtî û Îslametiyê da heye, tinebû. Cihûyan ev tişt ji Zerdeştîtiyê wergirt, ji ber ku têda wêneyekî temam û dagirtî li ser "*Jiyana Piştî Mirinê*", Rawestina Mirovan ji nû va, Hesab û Pîvana Xêr û Gunehan, Sezadan, Pira Selatê, Bihuşt û Dojehê heye.

Ev bû bi kurtahî rêveçûna ramana ayînî kurdistanî ji demên kevnare da heyanî ketina emperatoriya Madan sala 550 b.z. Ev jî piştrast dike ku Kurdistan ne welatekî vala bû ji ayîn û ramanên olî. Bi vajayî wê, ew di hemû warên jiyanê da navenda van ramanan bû. Belê, ramanên ayînî li Kurdistanê peyda bûne. Kurdistan herdem warê hêrzana van raman bûye, û ji wir şewq û tîna xwe daye hemû ayîn û olên seranserê Rojhilata Navîn.

Jêder:

[1] Mohamad Payyûmî Mihran: Dîroka Îraqê ya Kevin, rûpel 23.
[2] Taha Baqir: Destana Gilgamêş, rûpel 141 û serinc 160.
[3] Samoel Gremer: Ji tabloyên Somer, rûpel 75.
[4] Arshak Savrastiyan: Kurd û Kurdistan, rûpel 42, Dyakonov: Midiya, rûpel 131 - 133.
[5] Gernot Wilhelm: Horî, rûpel 100. Sabatino Muscati: Şaristaniyên Samî yên Kevnare, rûpel 258.
[6] Jefry Barner: Baweriyên Ayînî li ba Gelan, rûpel 147. Arnold Tuinbi: Kurtahiya Dîrokê, rûpel 2/187
[7] Samoel Gremer: Efsaneyên Cîhana Kevin, rûpel 313.
[8] Dyakonov: Mîdiya,,rûpel 355, 378. Hamed Abdulqadir: Zerdeşt Pêximberê pçşiyên Îraniyan, rûpel 24. Abdulhamid Zayed: Rojhilata Hemdem, rûpel 653, 655.
[9] Gernot Wilhelm: Horî, rûpel 133, 134. Fadil Abdulwahid Ali: Ji Somer heya Tewratê, rûpel 154. Pirtûka Pîroz, Dema Kevin, Rêîtiya Rastguhên Pêşîn 16, Ayet: 9 - 11, 21 - 22.